

# Grûbên civakî yê xebatê Beledîya (SIG ) Borlânge



## Grûbên xebata civakî (SIG) çine?

- SIG grûbek hevkar ji bo ciwanên 13-25 salî ye.
- Destûr ji welîyê zarokê û ji wê zarokê tê stendin, paşî meqamên resmî yê cuda, li ser bingeha ihîiyaca mirovê ciwan kom dibin.
- Temsîlkarên meqamên resmî herî pir ji xizmeta civakîne( koordîne kirin jî), polis, asîstanê tetbîqî, tedavîya vekirî ( lênerîna bêyî razana li nexweşxanê) ya beledîyê, mamoste, midûrê dibistanê, daîreya kar, meclîsa wîlayetê, lênerîna tawankara yan jî meqamên dinî lênerîna û/ kêşên ji bo mirovê ciwan giring bin.
- Xizmeta civakî berpirsiyarê xebata grûba civakî û yê dokumentasyonê (belgekirinê) yê. Lêkolîn wekhev li gor beşa 11 benda 1 SoL qanûna xizmeta civakî tê vekirin. Pê de lêkolîna SAVRY (Structured Assessment of Violence Risk in Youth) pêk tê. Ku ev alaveke ji bo nîrxandina ciwanên 13-20 salîye. Ev prosesa neqandinê li derdora SIG de te bi kar anîn ku li vir dubarebûna şideta sûçdarî û tawanbarîya cidî tê nîrxandin.
- Li derdora her mirovê ciwan planek tê çêkirin, bê mirov gerek bighêji kîjan hedefan û çawa mirov bighêjî van hedefan.
- Hedefa yekemîn ,mirov ciwanan ji derwî tawanbarîyê bihêle, mirov nehêle ku grûbên tawankar wana bigişîna nav xwe û mirov hêsanîyê ji wanre çêke ji bo ku ji grûbên tawankara derkevin.
- Sirveşartin ji bi hemû meqaman / kesan derbas dibe.

## **Çi alîkarîyan mirov dikarî bistîne?**

Ev meqamên cuda/kesên alîkarîyê û destekê didin, bi piranî li ser bingeha ihtîyaca şexî vê alîkarîyê pêşkêş dikin. Bo nimûnê ihtîyaca li ser bingehê:

- Tawankarî
- Neçêbikaranînê madeya narkotîk
- Tevahîya problêmên dibistanê
- Rewşa malbatê
- Teşhîsa psîkiyatîk hwd(her wekî din)

Alîkarî ji van tiştan pêk tên

- Axaftin/sedem nîşan dan
- Lênerîn/şexsî/malbat
- Planên tedbîrê li dibistanê, li daîreya kar hwd(her wekî din)

## **Ez çawa dikarim têkilîyê bi SIG re daynim?**

Tu kesî nasdike/ihtîyaca te bi SIG ve heye yan jî di derheqa SIG de tu hizir dike? Bi yê herî nêzîk ve têkilîyê dayne

- Xizmeta Sosyalê(civakî)
- Polîs
- Midûrê dibistanê/mentor(rêber)/kurator (şewirdarê karên civakî)
- Asîstanê tetbîqî
- Lênerê tawankara/mifetişê tawankara
- Asîstanê daîreya kar
- Kesên din mîsal: psîkiyatî, LSS, habîltasyon, Brå

## **Bi hevdû re em bi hêzin**